- Koruyucu ve önleyici sağlık hizmetleri amacıyla 'Halk Sağlığı Birimleri ve Halk Sağlığı Merkezleri'ni kuracağız. Bu merkezlerde kanser ön teşhisleribaşta olmak üzere bir çok hastalıkla ilgili tarama çalışması yapacağız.
- Sağlık kurumları, odalar, sivil toplum örgütleri ve sendikalarla ortak çalışmalar yürüteceğiz.
- Gezici Sağlık Ekipleri ile mahalle ve köylerde sağlık taramaları ile içme suyu denetimlerini yaygınlaştıracak, anadilinde sağlık ve hijyen eğitimleri vermeye devam edeceğiz.

- Bařta kanser hastaları olmak üzere, baęıřıklık sisteminin zayıfladıęı tedavi süreçlerinde, toplu tařımanın ciddi bir risk oluřturduęu hastalar için, saęlık merkezi veya hastanelere ulařımı kolaylařtıran, ücretsiz servis aracı hizmeti sunacaęız.
- Tüm okullarda ve köylerde gezici ve ücretsiz aęız ve diř saęlığı taraması çalıřmalarını yaygınlařtıracaęız, ihtiyacı olanlara ücretsiz tedavi hizmeti vereceęiz.
- Kadınların kolay eriřebileceęi ana-çocuk saęlığı merkezleri açmaya ve ücretsiz muayene, ilaç, ařı, çocuk bezi ve çocuk maması temini gibi hizmetleri vermeye devam edeceęiz.
- Bütün saęlık hizmetlerini engelli bireylerin eřit eriřebileceęi řekilde düzenleyeceęiz.
- Göçmen ve mültecilerin anadilinde saęlık hizmeti alabilmesini saęlayacaęız.
- Saęlık meclisleri, ilgili kurum, kuruluş ve medya organları ile birlikte genetięi deęiřtirilmiř gıdaların tüketimini azaltmak için ortak kampanyalar yürüteceęiz. Saęlıksız besin satıř ve daęıtımını yapanlara yaptırım uygulayacaęız..
- İnsan saęlığını etkileyecek çevresel faktörlerle etkin ve ekolojik mücadeleyi kesintisiz sürdüreceęiz.
- řehir ve ilçe merkezleri dıřında ikamet eden yurttařlarımızın merkezlerde bulunan hastanelere tedaviye geldikleri zaman, ihtiyaç halinde yararlanabilecekleri misafırhaneler ve ařevleri açacaęız.
- Gluten hassasiyeti olan kiřiler ve Çölyak hastaları için, pahalı olan ve yařamlarında büyük bir soruna dönüşen beslenme haklarını gözeterek, ihtiyaç duydukları ürünlerin üretimini yapacak ve aynı zamanda bu ürünlerin eriřilebilirlięini kolaylařtıracak satıř noktaları oluřturacaęız.

BÎ HEVRE DEMAMED

**PÎLANA BAJARÊ AMEDÊ
YA JI RABIRDÛYÊ
HAYDAR JI PAŞEROJÊ
RE AMADE YE**





BI HEVRE DEMAMED

Em ê bi hemû pêkate û gelê Amedê ku; ji mafê civakê, zayendî, astengdar, ekoloji û ji mafê hemû hemwelatîyan re hesas û haydar e; di şûna bajarê berfireh dibe de; yê bajarbûniya ekolojik ku sînorê wê heye em ê esas bigirin. Li ser esasê parastin û plansaziya hemûyê bajar hafizeya dîrok û çanda wê biparêzin bi rêve bibin.

Ji Rêveberiyên Heremî Yê Partiya Demê yê Amedê re

- Em ê Xizmetguzariya bajar bi referansa Etutên Zanistî yên Erdê bikin
- Ji bo em pêşî li hatina bajariyê bigirin 'em ê hevsengiya Bajar û Çolterê daynin û xizmetên aborî, civakî û çandî bê navber bibin çolteran.
- Ji bo bajarekî ku têra xwe bike; li ser esasê niştecihî; avahiyên ekolojik, kuçe, binesazî û sererdê de, bi avakirina qadên keskahiye re dê bigîje nasnama xwe ya resen.
- Em ê nexşeya qerebalixiya Amedê derxin, li gor wê tedbîrên aram bigirin.
- Li çend ciyên ddiyarkirî em ji bo kolanên çand û hunerê yê kêrhatî ava bikin dê projeyan derxin.
- Em ê 'Saziya Estetîkî ya Bajar' ava bikin û li gor pêşniyarên saziyê bajarê xwe bi rêve bibin.
- Em ê Meydanên Bajar zêdetir û bi kêrhatîtir bikin.
- Bajarê Amedê ku ciyê Çandinî û Cotkariyê ye em ê destûra îmarê ji van ciyan re nedin, wan deran biparêzin.
- Bi taybetî li gund û taxên xizan de ji bo avahiyên xwirt û saxlem werin çêkirin em ê piştgiya projeyên endezyarî û Mîmariyê bikin

LI HEMBER AFETAN AMED A XWERAGIR

Di Erdhêja 6ê Sibatê de di bajarê me de gelek hemşehriyên me jiyana xwe jîdest dan. Bi sedan mal-avahî xera bûn. Bi êş û janeke mezin ji me re bû cerebe; di afetan de derket holê ku tev jî di encamê sermayedariya desthilatdarî û polîtîkayên wan ê rantê de rû dane. Di pêvajoya Rêveberiya me ya Heremî de serî de li hember erdhêjan li hember hemû afatên xwezayê em ê amadekariyên xwe bikin. Ev peywirê me ye.

ACİL DURUM ÇAĞRI SİSTEMİ



Ji bo vê Di Rêveberiyên Heremî Yê Amedê yên Partiya Demê de;

- Em ê nexşeya Rîsk a Afetan ya Amedê derxin.
- Em ê bi hemû dînamîkên Amedê yê heremê re Plana Çalakiyên Lezgîn yê Afatê Amedê amade bikin. Ji bo destwerdana lezgîn jî zerengiya teknîkê xwirtir bikin.
- Em ê berî afat û piştî afatan rêxistinkirina Kordîne û Rêveberan bi hesasiyeteke mezin plansaziya xwe bikin.
- Bi cerebeya 6ê Sibatê re, dibetiyên Afat û Rîskên rû bidin de ji bo wan

berteref bikin em ê bi hemû Sazî û Dezgeyên Sivîl yê bajar re bixebitin da ku Piştgiriya Platforma Bajar û Kordînasyona Qeyranê ava bikin.

- Em ê li hember Afatan ligel gelê xwe, bi hevdu re bi modeleke kolektîf bikin. Bi vê hawî li tax û gundên xwe de em ê ekîbên dildariyê yê Afatê ava bikin.
- Em ê Li Tax û Gundan perwerdeya amadekariya Afatê bidin.
- Em wekî Rêveberên Heremî di dema Afatan de ji bo ciyê lê kom bibin-bi cih bibin û piştî afatê jî ji bo avahiyan qadên rezervên wan diyar bikin.
- Bi awayeke periyodik em ê senaryoyên Afatan bikarbînin.
- Li hember laseran em ê bi lezgînî dest bi xebatên binesaziyên bi aqil bikin.
- Di salên dawî de ku em dibînin bûyerên xwezayê yê laseran pir diqewime. Ji bo astengkirina van bûyeran em ê Yekîneyên ku li derê laser çêbibe bi lezgînî û bi bandor ew dera bidin valakirin ava bikin.
- Qenal û erxên ku di nava niştecihên taxê -malan re derbas dibin, ji bo lehiya ava wê kêmbikin, li gor sirûştê şert û mercên wir werin sererastkirin em ê ji nû ve bigrin dest û periyodik bişopînin.
- Li qadên ku di bin xeteriya Afatên xwezayê de ne û li gor jeolojiyê ne guncav e (wekî; aştî, lehî laser û hwd.) em ê li wan deran dawî li avabûna malan-xaniyan bînin. Rê nedin were avakirin.
- Em ê envantere rîska avahiyên ku li bajar kom bûne derxin holê.
- Di mijara xwirtkirin, di şûna xwe de avakirin û li gor pêdiviyên derkevin holê ji bo avakirina Xaniyên Komalî (sosyal konut) em ê serî li dîtinên Odeyên Pîşeyan û Zanîngehan xin û bihevdu re bixebitin.
- Em ê rêveberiyêke bi feraseta alîgiriya civakî, xwezayî esas bigirin û li dijî navendên rantê, yê berjewendiyên gel nagrin balê rawestin, civakê bi giştî wekî aborî, cîwarî û bi komalî binerxînin û welê nêzîk bibin.

JI BO AMEDA XWERAGIR DI CIHÊ XWE DE VEGUHESTIN

Di bin navê veguheztina bajarî de bajar wergeriyaye qada ranteke mezin. Em destwerdana avahiyên bi rîsk teqez dibînin û wê diparêzin. Lê çawa? Serî de em desthilatdariyê ku bi hawê Rant-Bajariyê, rêveberiya veguheztina bajariyê red dikin. Lewra projeyên desthilatdariyê; di serî de ruxandina hafizayê, bê hêjmar rîskên ekolojîk, sosyolojîk û aboriyê vediguhezîne biyanîtiyê. Em ê ji bo avahiyên bi rîsk bi perspektîfa daneyên zanistî, bi tevlêbûna welatiyan bêyî ku xwezaya wê bajarî xera bikin, bêyî ku gel mexdûr bikin veguhestinên xwecihî pêk bînin, ava bikin.



Bi vê boneye; Di Rêveberiyên Heremî Yên Partiya Demê ya Amedê de;

- Em ê li hember feraseta 'rant û Bajar'iyê bi veguheztinên xwecihî ji bo mafên stareyên wekhev plan û projeyan çêbikin.
- Em ê di bajarbûniya Ewrûpî de rêgez û şertên Ewrûpayê esas bigirin.
- Cihên ku bi destnîşana şandeyên pîspor hatine diyarkirin ku di bin rîskê de ne, em ê bi erêkirina gel re ew 'baş bikin' û bi 'tendurustiyê' di cih de bixin jiyanê.
- Em ê bi çand û feraseta piştgiriya cîrantiyê, di pêvajoya erdhêjê de ku bi baweriyê xwîrt veguhestinê esas bigirin.
- Em ê di şûna malên bi fîzîkî hatine terkirin, berdan de, bi awayê komalî, çandî û aborî bi tevlêbûneke çêker projeyan pêş bixin

MAFÊ STIRÎNA EWLE, QEWÎ Û ERZAN!

MAFÊ bajêr bi mafê stirînê dest pê dike. Yek ji peywîrên bingehîn ên rêveberiyên xwecihî jî ew e ku mafê stirînê yê hemwelatîyan biparêze.

Ji bo vê yekê; Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMÊ de;

- Ji bo hemwelatîyên me yê kêmdêrketî, di pêvajoya li pêşiya me de, em bi biryar in ku em stargehên civakî yê qewî û erzan bisepînin. Em ê plansaziya van stargehan di nava qadên hevpar de, bi awayekî ku têrî xwe bikin çêbikin û em ê piraniya pêvajoyên plansaziya van avahiyan bi hemwelatîyan re çêbikin.

- Ji bo pêdiviya stargehan a gel bi cih bînin, em ê bi kooperatîfan û yekîtiyan, bêyî ku tê de kar bikin, planên avahiyên xwezaparêz û tendurist saz bikin û bisepînin.
- Ji bo xaniyên gundan em ê piştgiriya amadekirina projeyê û şewirmendiyê ya bê pere bidin.
- Ji bo nexweşan û xizmên wan, em ê mêvanxaneyan ava bikin.

PLANA MASTERÊ YA VEGUHASTINA ERZAN, EWLE, TÊR Û XWEGIHANDINA WÊ HÊSAN

Her wekî tevahiya bajarên ku mezin dibin û qada xwe fireh dikin, pirsgerêkên veguhastina tomerî yên Amedê jî bi tevahiya xetere û malîyeta xwe her roj hinekî din zêdetir dibin. Wek rêveberiyên xwecihî yên Partiya DEMÊ, li tevahiya bajaran em modela veguhastinê ya li gor û ji bo peyayan a tomerî diparêzin. Ji bo Amedeke xwehez, li dijî hişmendiya veguhastinê ya ku dibe sedema têkçûna xwezayê, em ê modeleke veguhastina tomerî ya erzan, ewle, têr û xwegihandina wê hêsan çêbikin. Li dijî bikaranîna siwareyan a takekesî ya ku barê trafîkê giran dike, qirêja deng û hewayê çêdike, em ê stratejiya veguhastinê ya tomerî ya ku girîngiyê dide peyayan ji bo gelê Amedê bisepînin.

DÎ RÊVEBERIYÊN ME YÊN XWECIHÊ YÊN AMEDÊ YÊN PARTIYA DEMÊ DE;

- Em ê Plana Masterê ya Veguhastinê ya Amedê li gor pêdiviyên heyî yên xwezaya bajêr û civaka bajêr nû bikin.
- Em ê li gor daneyên zanistî û lêkolînên li qadê, pêşxebatên veguhastinê yên bajêr û planên bingehîn ên veguhastinê saz bikin.
- Em ê bi daneyên ku ji tevahiya sazî û dezgehên tên, sazî û dezgehên berpirsiyarên veguhastinê baş diyar bikin û bikin ku li gor peywir û berpirsiyariyên xwe tevbigerin.
- Em ê modela veguhastinê ya ji bo jiyana xwezayî ya bajêr guncaw bisepînin. Em ê veguhastina ku bi siwareyên taybet çêdibe ya ku zirareke mezin dide xwezayê û barê aborî jî girantir dike kêr bikin; ji bo vê yekê em ê bi awayekî periyodîk li bajêr kampanyayan li dar bixin.
- Em ê destwerdanên bi rêgeza veguhastina li gor peyayan, ne li gor siwareyan bikin û em ê peyarêyên bajêr li gor ku peya bi hêsanî, bê navber bikaribin bi kar bînin çêbikin.

- Em ê ji bo plana veguhastinê, bi rêgaza veguhastina li gor peyayan, en li gor siwareyan, peyarê û rêyên duçerxeyan ên bê navber li tevahiya kuçe û kolanên bajêr çêbikin.
- Em ê bi modelên veguhastinê yên ku li gor peyayan hatine amadekirin, rêyan, kuçe û kolanên veguherînin qadên çandî yên ku ji trafîka giran û siwareyan hatine rizgarkirin.
- Em ê li derbaseyên peyayan, pergala anonsa bi deng ên ku dema derbasbûna peyayan diyar dikin çêbikin.
- Em ê kuçeyan wek cih û warên civakî ji nû ve bisêwirînin. Lewra kuçe cih û warên civakî yên ku mirov civakî dibin, cudatîyên statuya civakî ji holê radibin, girîngiya pêşengiya aborî û civakî namîne, raçînkê çandî bi awayekî şênber xuya dibe ne.
- Em bi biryar in ku em projeya xwe ya pergala rêya hesinî vesaz bikin û bikin xizmeta gelê xwe.
- Em ê ji bo ku her kes bi hêsanî bikaribe bi kar bîne, tora xwe ya veguhastinê berfireh bikin û siwareyên nû bigirin. Em ê di veguhastina tomerî de siwareyên ku emîsyona wan kêmtir in an jî tune ne bi kar bînin. Ji bo veguhastineke ewletir, em ê bi awayekî domdar venêrîna siwara û ajovanan bikin.
- Em ê çareseriyên pîraliyê ji bo cihên ku pîrsgirêka bicihkirina siwareyan hebe, bibînin.
- Em ê di tevahiya projeyên pîreyên li ser cadeyan ên peyayan de sepna hilanokê pêk bînin.
- Em ê ji bo çêkirina rêyên dora bajêr ên ku dê kêşeyên veguhastinê yên Amedê kêmtir bikin, polîtîkayan bi pêş bixin.
- Em ê ji bo ku têkiliya di navbera herêmên lojîstîk û bendergehên bazirganiyê de bi rêyên mezînan ên welêt û rêyên hesinî çêbibe, xebatan bikin.
- Em ê li navçeyên me yên ku otogar lê tune ne, ji bo siwareyên veguhastina tomerî û siwareyên gundan otogaran çêbikin.

AMEDA KU ENERJİYA XWE HILDİBERÎNE

Ji bo kêmkirina bandorên ku bajarvaniyê û qeyrana avhewayê li qadên jiyane afirandine, bi armanca domdariya civakîbûnê, xwezaparêziyê û parastina aboriya bajêr, em şarevaniya kesparêz diparêzin. Bi vê hişmendiyê, di rêveberiyên xwecihî de, di qadên elektrîk, elektronîk û ragihandinê de, ji bo Amedeke Kesparêz;

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê ji bo afirandina hişmendiya Berhemdariya Enerjiyê kampanyayan çêbikin.
- Em ê ji bo ku di germkirin û sarkirinê de bikaranîna enerjiyê kêm tir bibe îzolasyona avahiyan teşwîq bikin.
- Em ê ji bo kêmkirina bikaranîna şewatên fosîl (rijî, petrol û gaza xwezayî) a li bajaran polîtîkayan biafirînin.
- Em ê ji bo sererastkirina binesaziya enerjiyê hêsankariyê bikin (xetên ku li derve ne em ê bikin binê erdê, em ê dîrekan kêmkirin, em ê navendên trafoyên nû di binê erdê de çêbikin û hwd.).
- Em ê li gor raçînka bajêr, avahîsaziya bajêr û jiyana civakî bajarê xwe (ronahiyên park, baxçe, qadên keskayî, avahî, kolan, refûj, enî, hwd.) ronî bikin; em ê kuçe û kolanan jî bi pergalên enerjiya rojê ronî bikin.
- Em ê Kooperatîfên Enerjiyê teşwîq bikin.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê bi hişmendiyeke ku bi xwezayê re li hev dike û xwezayê diparêze tevbigerin, çavkaniyên enerjiyê yê jixweder bikar bînin û enerjiya xwe biafirînin. Bi dahata ku bi vî awayî em ê bi dest bixin, em ê ji bo bikaranîna enerjiya jixweder piştgiriya bidin gelê xwe.
- Em ê piştgiriya bidin gel ku di serî de banên avahiyên wek xanî, sîte û malên tomerî, panelên rojê deynin cihên guncaw û enerjiya xwe biafirîne.
- Em ê gund û bajarên mînak ên ku dê bi çavkaniyên enerjiya jixweder enerjiya xwe diafirînin, ava bikin.
- Em ê piştgiriya bidin cotkarên kêmdarfet ên ku bi elektrîkê avdana xwe dikin da ku bi pergalên enerjiya rojê enerjiya xwe biafirînin û bi kar bînin.
- Em ê ji bo birina ava vexwarinê ya gund û taxan pergalên enerjiya alternatîf bi kar bînin û em ê tu cih û warekî bêyî ava vexwarinê nehêlin.

AV JIYAN E, JIYANÊ BIPARÊZE

Pirsgirêka ava paqij veguheriya qeyraneke herêmî û gerdûnî. Ji ber vê yekê, divê em bikaranîna avê û birêvebirina avê wek kêşeyeke stratejîk bigirin dest. Wek şaredariyên Amedê, em rêgeza bikaranîna dadwer a avê diparêzin. Li dijî veguherandina metayeke bazirganiyê û çêkeke stratejîk a avê; em parastin û bi-



karanîna tejanê û çavkaniyên avê ya bi modelên bi beşdarî diparêzin. Di mijara bikaranîna avê de, em ê li bajarê xwe standardekê bi pêş bixin. Em dadixuyînin ku em ê bi rêgeza ku av ji bo tevahiya giyaneweran yek ji mafên jiyânî yên bingehîn e, tevbigerin.

Bi bîr û baweriya AV JIYAN E; Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê ji bo parastina tejaneyên avê xebatên zanistî bikin.
- Em ê ji bo bikaranîna avê ya bi tesaruf û dadwer nexşeyên hişkiyê amade bikin.
- Em ê pergalên ava qirêjî û paqij li gor pêdiviyên rojane nû bikin.
- Em ê ji bo veguherandin û bikaranîna ava gewr (ava baranê, hwd.) a di avdanê de xebatên binesaziyê bikin.
- Em ê polîtîkayên beralîkirina qirş û qalê ya ku pergalên avê qirêjî dikin biterikînin. Em ê hişmendiya “palavtinê” biguherînin; em ê bikin ku dev ji sepanên deşarja qirş û qalê yê di robar û birkan de bê berdane. Em ê rêbaza palavtinê ya pêwîst a ji bo rêveberiya qirş û qalê (palavtina biyolojîk a pêşketî ya ji bo qirş û qala malan jî di nav de) û rêveberiya qirş û qalê ya jihev cudakirina qirş û qala malan û pîşesaziyê bisepînin.
- Em ê têkoşîna xwe ya li hemberî kanên ku ava heyî tune dikin, kanên xîzê û kevîran û polîtîkayên avahîsaziyê yê li van herêman, bidomînin.

- Em ê dawiyê li avdana bêpergal a di çandiniyê de ya ku di wendabûna çavkaniyên ava vexwarinê de xwediye roleke girîng e, bînin û em ê ji bo bipêşxistina avdaniya bi pergala dilopan xebatan bikin.
- Navenda bajêr a Amedê yek ji kêma cihan e ku ji kaniyên di nava malan de ava vexwarinê tê. Em ê vê xizmeta ku bi destê rêveberiyên me yê xwecihê yê berê ve ketiye meriyetê xurtir û erzantir bikin da ku gelê Amedê bi hêsantir bikaribe xwe bigihîne ava vexwarinê ya bi kalîte.
- Em ê xizmeta ava vexwarinê ya erzan û paqij bibin tevahiya gund, gundik û malan.
- Em ê li cihên ku ava wan tune ye, kaniyên kuçeyan ên bi sensor çêbikin.

AMEDEKE JI BO DAHATÛYÊ @MADE

Teknolojî her tim bi pêş dikeve. Gelheya bajêr zêde dibe. Em ê zanist û teknolojiyê bikin xizmeta hemwelatiyên li bajêr û em ê jiyana li bajêr hêsantir bikin.

Di Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê Pergalên Zanyariyên Bajêr li Amedê bisepînin.
- Em ê Navendên Dîjîtal ên Afirandina Zanistê damezirînin.
- Em ê navendên sepandinê yê Fen û Bîrkariyê bikin xizmeta gel.
- Em ê bi sepanên mobîl xwegihandina dîjîtal a bajêr hêsantir bikin.

GAV BI GAV AMEDA XWEZAPARÊZ ...

Amed bi mîrateya xwe ya dîrokî û çandî, xizîneyek e û em dikarin ji nîfşên nû re bihêlin. Ji bo vê yekê, di tevahiya pêvajoyên rêveberiya bajêr de, em ê bi perspektîfeke xwezaparêz binihêrin. Em ê Amedê mehkûmî çîmento, rijî û asfaltê nekin. Em ê destûrê nedin ku bajar çolteriyê da-gir bike. Em ê qadên xwezaparêz ên ji siwareyan re girtî çêbikin û bi vî awayî hem em ê xwezaya bajarê xwe biparêzin û hem jî em ê derfetê bidin hemwelatîyan ku bajêr bi hêsantir bi kar bînin.

Di Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê li gelek cihên navenda bajêr û navçeyên xwe baxçeyên botanîk ên ku cureyên endemîk ên nebatan lê bînin çandî, çêbikin.

- Em ê hejmara park û baxçeyên li tax, gund û navçeyên xwe zêde bikin; em ê li park û baxçeyan darên fêkiyan ên li gor avhewaya bajêr biçînin.
- Em ê li bajaran sîgeh û herêmên xwezaparêz ên ji siwareyên bi maşîne re girtî yên ku gel bikaribe bêhna xwe vede û demeke xweş lê derbas bike çêbikin.
- Em ê ji bo rêgirtina li ber tawanên ku li hemberî xwezaya bajêr, dîroka bajêr, flora û faûnaya bajêr pêk tînin, rêzîknameya ‘Tawana Bajêr’ amade bikin û bisepînin.
- Amed dê bibe bajarê Gulistanan. Heta 20-30 sal berê jî bêhna gul û kulîlkan ji kuçe û kolanên Sûra Amedê dihat. Em ê vê yekê vejînin. Devê Dîcleyê jî di nav de, em ê sê gulistanên ku dê li ser 60 donim erdî bin, li bajarê xwe çêbikin.

AMEDA KU XWEDÎ LI DARISTANÊN XWE DERDIKEVE

Daristan pişikên bajarên me ne. Em ê nehêlin ku pergala kapîtalîst a ku bajaran vediguherîne lodên çîmentoyê Amedê dîl bigire.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê hejmara daristanên bajêr zêde bikin. Li hemû navçeyan em ê daristanên bajaran çêbikin.
- Em ê daristanên ku hatine talankirin û şewitandin bi kampanyaya “We Şewitand Em ê Şîn Bikin” vejînin.
- Em ê yekîneyên ku daristanan biparêzin û hişyariyê biafirînin ava bikin.
- Em ê kooperatîfên şaxan ên ku dê ji bo şaredariyan şaxan hilberînin zêde bikin. Em ê şitl û şaxan bê pere li gelê xwe belav bikin.
- Em ê rê li ber talankirinên heyî yên li hemberî daristanên bajêr ên heyî bigirin.
- Em ê di binê banê beşên agirkujiyê de yekîneyên destwerdana lezgîn a li hemberî agirên damezirînin. Li qadên çolter jî em ê ‘Malên Daristanan’ ên ku dê lê kel û pelên pêwîst hebin damezirînin.

AJAL E SEWAL E HEVAL E

Em ê ji bo ajalên ku li kuçe û kolanên dijîn Amedê bikin bajarekî xweştir. Em ê xebatên xwe yê şarevaniyê li gor Daxuyaniya Mafên Ajalan bikin.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yên Partiya DEMê de;

- Em ê bi sazî û dezgehên ku mafên ajalan diparêzin re perwerdehiyên afirandina hişmendiyêke ajalparêz çêbikin.
- Em ê ji bo ajalên ku pêdiviya wan bi venêrîne hebe qadên jiyane û ji bo ajalên li kuçeyan dijîn jî navendên tenduristiyê yê bê pere damezirînin.
- Em ê li parkên navendî bi awayê ku zarok û ajalên li kuçeyan dijîn bi hev re bikaribin bi kar bînin, "Parkên Ajalhez" çêbikin.
- Em ê ji bo ajalên li kuçeyan dijîn navendên xwarinê, avdankan çêbikin, tabelayên şiyarkirinê yê parastinê û afîşan daleqînin.
- Em ê ji bo bidawîkirina bikaranîna fişekên hewayî xebatên hestiyariyê bikin.
- Em ê ji bo tedawîkirina ajalên li kuçeyan dijîn ên ku tenduristiya wan xerab bûye yan jî yê birîndar bûne qadên jiyane yê demborî damezirînin.
- Em ê li hemberî nêçîrvaniyê hestiyariya ji bo parastina ajalan xurt bikin.

AMEDA HILBERÎNER, AMEDA KU TÊRÎ XWE DIKE

Li gor zagona şaredariyan, divê şaredarî ji aliyê aborî ve bi bajêr ve bibin yek û di vê qadê de xebatan bikin. Li gor bîr û baweriyaya me ya rêveberiyên xwecihî, xizmetên şaredariyê bi tenê ji xizmetên binesazî û seresaziyê pêk nayên. Ji bo ku Amed wek bajarekî ku têrî xwe dike û hildiberîne dahatûya xwe bike binê ewlehiyê, em ê aboriya xwecihî xurt bikin; em ê gelê xwe radestî mêtîngerî û cudakariyê nekin. Di vê çarçoveyê de bi xebatên ku em ê bikin, em ê hevsenga hilberîne çêbikin, xwezayê biparêzin û bêkariyê kêm bikin.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yên Partiya DEMê de;

- Em ê ji bo bipêşxistina aboriya xwecihî û herêmî Serokatiya Daîreya Bipêşxistina Aboriya Xwecihî dîsa damezirînin.
- Em ê malên hilberîne yê taxan damezirînin.
- Em ê ji bo bipêşxistina mêşvanî û hilberîna kurmên qozeyan hêsankarî û palpiştiyê bikin.
- Em ê li hemberî bêkariyê, di qadên cuda de ligel kooperatîfên ku gel ava kirine qadên nû yê kar biafirînin.
- Em ê piştgiriya bidin Kooperatîfên Hilberîn-Berxurî û Xizmetê yê ku ji aliyê gel ve tên damezirandin û li ser bingeha ku têrî xwe bikin û li gor rêgeza bi



hev re kar bikin. Armanca van kooperatîfan dê ne karkirin an jî tekedestîbûn be û dê hilberîn li gor nîrxên bikaranîne bê kirin.

- Em ê pergaleke ku hilberîna xwecihê zêde bike, bazarên xwecihê ava bike û ber û berhemana ji hilberîner rasterast bigihîne ber destê berxwura saz bikin.
- Em ê xebatên perwerdehiyê û kargehên ji bo gel ên der barê kooperatîfbûyînan di qadên wek enerjî, xurek, çandinî, perwerdehî û şitl û şaxan de çêbikin.
- Em ê sûkên gelêrî yê wek “Sûka Şewitî” û esnafên biçûk biparêzin.
- Em ê qadên bi kevir ên li Qerejdaxê paqij bikin û ji bo çandiniya organîk amade bikin. Her wiha em ê kevirên ku hatine berhevkirin jî bi kar bînin. Em ê di nava 5 salan de li herêma Qerejdaxê qadeke bi qasî 40.000 doniman ji bo çandiniyê amade bikin.
- Em ê li tevahiya navçeyan bazarên ber û berhemên ajalan û yê herêmî ava bikin û li van bazaran hilberîneran û berxwuran bigihînin hev.
- Em ê li qadên çolter ên ku nikarin xwe bigihînin xizmeta beytariyê, ji bo hemwelatîyên xwe xizmeta beytariyê ya gerok pêşkêş bikin.
- Em ê bi hevkarîya şaredarî û kooperatîfan, pêşiyê, cih û warên firotina xurek û kel û pelên berxuriyê yê ku li taxên xizan ên bajêr hatine hilbrandin vekin da ku wan ber û berhemana bigihînin gel.
- Em ê piştgiriya bidin hostetî û hunermendiya gelêrî û wan bi pêş bixin.

RABE PIŞTEVANIYÊ AMED!

Xizanî pîrgirêkeke hilweşîner a ku ji aliyê dewlet û sermayeyê ve hatiye afirandin û zindî tê hiştin e. Wek rêveberiyên xwecihî yên Partiya DEMê yên Amedê, em ê li hemberî pergala ku xizan dike û bi xwe ve girêdide, polîtîkayên alternatîf bi pêş bixin. Ji ber vê yekê, em ê têkoşîna li dijî xizaniyê wek yek ji berpirsiyariyên giştî yên şaredariyê binirxînin û li dijî wê têbikoşin.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yên Partiya DEMê de;

- Em ê nexşeya xizaniyê ya bajêr çêbikin û li gor wê nexşeyê plansaziya xwe çêbikin.
- Em ê li şaredariyên xwe yên Amedê torên hevgeriya civakî ya parveker çêbikin.
- Em ê bi çanda wergirtina kar û hevgeriyê, bi tevahiya dînamîkên li bajêr re tevbigerin û li dijî xizaniyê têbikoşin.
- Em ê pêşengiyê bidin polîtîkayên parastinê yên ji bo jin, zarok, astengdar û kal û pîrên ku herî zêde di binê bandora xizaniyê de dimînin.
- Em ê bergiriyên ku zarokan di binê bandorên tuneker ên xizaniya ku ji ber “xebatkarên zarok” ên ku bi xizaniyê re zêde dibin de dihêlin diparêzin, bisepînin.
- Em ê ji bo wergirtina kar kûrsên pîşeyî yên pîrcureyî vekin.
- Em ê yekîneyên Têkoşîna Li Dijî Birçîtî û Xizaniyê zêde bikin.
- Em ê ji bo hemwelatiyên xizan sepana PIŞTEVANÎQERTê bikin meriyetê.
- Em ê li taxan navendên xurekan ên ku hevgeriyê xurt dikin, damezirînin.
- Em ê li gelek taxan sepanên wek tendûrên nanê gel, malên tendûran, kaniyên şorbeyan bikin meriyetê.
- Em ê li herêmên cuda yên bajêr XWARINGEHên gel ên ku armanca wan a karkirinê tune be, damezirînin.
- Em ê piştgeriya qirtasiye û xwarinê bidin zarokên ku diçin dibistanê.

EM Ê LI CIH Î WARÊN XWE BIXWIN NANÊ XWE EM ÇANDINIYA GELÊRÎ GEŞ DIKIN

Li tevahiya Tirkiyeyê, li gor daneyên sala 2020'î, li gor nirxa hilberîna çandiniyê, di nava 81 bajarên de, Amed di dora 13'emîn de ye. Pergala desthilatdar; bi armanca ku lobiyên xurek û çandiniyê kareke zêde bi dest bixin,

polîtîkayên çandiniyê yên ku di qada pîşesaziyê de kirî meriyetê bi rêbazên modernîteya kapîtalîst bazar dike. Kesên ku bi awayekî nano ziko çandiniyê dikin wek hêza kar a erzan bi darê zorê koçî bajarên sermayeyê yên di nava lepên pençeşêrê de dibin. Em ê ji bo ku jiyana li qada çolter bidome, bostanên ku bajarên têr dikin bîst parastin, desthilatdariya xurekan a li qadên xwecihî bi dawî bibe; çandiniya gelêrî teşwîq bikin.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yên Partiya DEMê de;

- Em ê ji bo geşkirina çandiniyê, bi awayekî periyodîk kargeh, panel, komxebat, sempozyûm û konferansan li dar bixin.
- Em ê tov û şitlên xwecihî belav bikin û bi vî awayî em ê zanyariyên çandiniya gelêrî bidin hev, arşîvekê çêbikin û bikin xizmeta cotkarên biçûk û kêmdarfet.
- Em ê piştgiriyê bidin hilberîna ajal û nebatên xwecihî.
- Em ê piştgiriyê bidin destnîşankirin û belavkirina nebatên xwecihî yên tibî û aromatîk.
- Em ê çandiniya ku bi rêbazên çandî tê kirin teşwîq bikin.
- Em ê li dijî polîtîkayên yekdestîparêz û qedexeker ên kartelên tov û şitlan ên gerdûnî yên ku li tevahiya cîhanê bandorker in, xebatên pevguherandina tov û şitlan bi pêş bixin.
- Em ê zeviyên ji bo çandiniyê guncaw, ji bo baxçevaniyê bikin xizmeta cotkarên biçûk û kêmdarfet.
- Em ê piştgiriya tov û şitlên xwecihî, êmê xwezayî, şaxan û gubreyê bidin cotkarên biçûk û kêmdarfet.
- Em ê Pirtûkxaneya Tov û Şitlên Xwecihî û Muzeya Çandiniyê ya Amedê damezirînin.
- Em ê şantiyeya gubreya xwezayî damezirînin.
- Em ê ji bo ku bi hev re bi kar binin, piştgiriya “alav û amûrên çandiniyê” bidin cotkarên biçûk û kêmdarfet.
- Em ê xizmeta weşangeriya çandinî û şewirmendiyê bidin cotkarên xwe.
- Em ê ji bo parastin û bipêşxistina ajalvaniyê xebatên binesaziyê bidin destpêkirin.
- Em ê Projeyên Tîp ên Qadên Avdaniya Çandiniyê (Pergala Pîvot) bi pêş bixin.
- Em ê bi armanca piştgirîdayîna çandinî û ajalvaniyê, li herêmên çolter birkên avdaniyê çêbikin.

BAJARÊ KU XUREKÊN WÎ TÊRÎ WÎ DIKINJI BO GELÊ AMEDÊ XUREKÊN XWEZAYÎ Û ERZAN

Şaredariyên me yê Amedê yê Partiya DEM'ê mafê xwegihandina gel ê xurekên tendurist, xwezayî û erzan diparêze. Wek ku tê zanîn, yek ji kêşeyên sereke yê dahatûyê jî qeyrana xurekan e. Rêbaza herî bandorker a têkoşîna li dijî qeyrana xurekan jî derbasbûna modela bajarê ku têrî xwe dike ye. Di vê çarçoveyê de Amed xwedî awantajên girîng e. Em ê van awantajan di pêvajoya rêveberiya xwecihê de bi awayê herî baş binirxînin û xwegihandina gel a xurekên xwezayî û erzan hêsantir bikin.

Di Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê ji bo xwegihandina gel a xurekên têr, erzan û baş planên demkurt û demdirêj saz bikin.
- Em ê alternatîfên ku xurekan bi awayekî xwezayî hilberînin û rasterast bigihînin berxwuran bisepînin.
- Em ê bi awayekî periyodîk venêrîna şert û mercên teknîkî û paqijiyê yê mezbaxane, cih û warên firotina ber û berhemên avê, eraseyên zezewat û fêkiyan, depoyên sarincî pêk bînin.
- Em ê bi hûrgilî pêvajoyên vekirina kargehan û dayîna destûrnameyan a van kargehên ku dê di qadên xurekan de bixebitin bişopînin.
- Em ê li dijî yekdestbûna karxaneyên xurekan ên pîşesaziyê, piştgiriye bidin kom û kooperatîfên çandiniya xwezayî û xurekên xwezayî.
- Em ê hilberîn û bikaranîna gubreya organîk teşwîq bikin.
- Em ê perwerdehiyên berbelav ên der barê xwarin û berxwuriya xurekên ewle de birêxistin bikin.

BAJARÊ KEDÊ AMED

Em ê şaredariyên xwe bi kedkaran re bi rê ve bibin. Em ê bi kedkaran re bigihîjin armancên xwe. Em ê li şaredariyên xwe ewlehiya kar, tenduristiya karkeran û ewlehiya karkirinê ji xwe re bikin bingeh; li dijî kedxwariyê polîtîkayan diyar bikin û bisepînin.

- Di Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê de;
- Em ê li şaredariyên xwe bi xebatkarên têr û tijî re bixebitin.



- Em ê dawayê li rêbazên xebatê yên ne diyar, bê rêzik û bê ewlehî bînin.
- Em ê di rêxistinbûna sendîkayî de peymanên navneteweyî ji xwe re bikin bingeh, bi sendîkayan re peymanên tomerî çêbikin û polîtîkaya mûçeyêke li gor rûmeta mirovahiyê bisepînin.
- Em ê di peymanên tomerî de şerha tundiye biparêzin; em ê xal û biryarên der barê tundiya li hemberî jinê de teqez bisepînin.
- Em ê li şaredariyên xwe pêşengiyê bidin wergirtina kar a jin û ciwanan.
- Em ê ji bo zarokên kedkarên şaredariyê baxçeyên zarokan vekin.
- Em ê 21'ê Adarê ji bo tevahiya xebatkarên, 8'ê Adarê û 25'ê Sermawezê jî ji bo xebatkarên jin wek rojên betlaneya bê pere daxuyînin.

DÎSA ÇAND DÎSA AMED

Yek ji cihêrengiyên sereke yên ku me ji hişmendiyên din cuda dike bîr û bawerîya me ya rêveberîya pirzimanî û pirçandî ya rêveberiyên em yên xwe-cihî ye. Bi stratejiyêke rêveberiyê ya ku kevn û nû digihîne hev, xwedî li mî-rateya çandî derdikeve; em ê Amedê ji hişmendiya nijadperest, zayendperest, neteweperest, çand û hunera teredî/dejenere rizgar bikin. Yek ji karên sereke yên şaredariyên me yên li pêşîya me jî ew e ku Amedê bikin bajarê çand û hunerê.

'HUNER AMED'

- Em ê mîhrîcanên çandî, zimanî û hunerî yê gelêrî veguhêzin navçeyên xwe jî, naverokên wan xurtir bikin û bidomînin.
- Em ê ji bo zindîhiştina çanda devkî û ragihandina wê ya nifşên nû hejmara Malên Dengbêjan zêde bikin. Navçe jî di nav de, em ê civat û şevbuhêrkên dengbêjan li tevahiya bajêr belav bikin.
- Em ê bi navê "Li Her Derê Huner" li taxan û gundan çalakiyên gerok ên çandî û hunerî çêbikin û hemwelatîyan tevî çalakiyên çandî û hunerî bikin.
- Em ê sazî û dezgehên wek Cegerxwîn û Konservatûara Bajêr a Aram Tîgran ên ku perwerdehiya muzîk û hunerê didin ji nû ve vekin.
- Em ê ji bo ku zarok û ciwan li taxan beşdarî kûrsên bê pere bibin, malên muzîkê damezirînin.
- Em ê cih û warên wek malên çandê, pirtûkxane, muze, galerî, eywanên sînema û şanoyê dîsa geş bikin.
- Em ê li her navçeyekê herî kêr pirtûkxaneyekê vekin û em ê li bajarên xwe piştgiriye bidin çanda xwendin û lêkolînê.

GER Û GEŞ AMED

- Em ê hawirdora Keleha Çêrmûgê sererast bikin û xwedî li mîrateya çandî û dîrokî ya Çêrmûgê derkevin.
- Em ê cih û warên tûrîstîk ên bajêr destnîşan bikin û nexşeya tûrîzmê ya bajêr amade bikin.
- Em ê Plana Çalakiyan a Tûrîzmê saz bikin, nirxên xwe yê çandî yê wek Birqleyn, Hîla, Goristanên Keyayên Asûrî, Şikeftên Hesûniyê, Bedenên Amedê, Baxçeyên Hewselê, Keleha Zerzewanê yê ku temenê wan bi hezaran salan dirêj e bidin nasîn û ji bo ku li navçeyên me tûrîzm bi pêş bikeve pêşengiyê bikin.
- Em ê hawirdora Eynqerîsa li navçeya Hênê ya ku ji bo tenduristiyê gelek kes serî lê didin, sererast bikin.
- Em ê li navçeyên xwe projeyên ku piştgiriye didin Agrotûrîzmê bisepînin.



'JI BÎR NAKE AMED'

- Em ê ji bo ku Girtîgeha Bi Hejmara 5'an bibe Muzeya Şermê bi dînamîkên li bajêr re xebatên hevpar bikin.
- Em ê Muzeya Bîra Bajêr damezirînin.
- Em ê berhemên ku bîra me zindî dihêlin DÎSA çêbikin.
- Em ê DÎSA navan li cih û warên ku navên wan hatine guherandin bikin.

DÎSA ŞAREDARIYÊN PIRZIMANÎ

Amed bajarekî kevnar ê pirzimanî û pirçandî ye. Em ê bi modela xwe ya rêveberiyên xwecihî ya pirzimanî û pirçandî tevahiya xizmetên ji nû ve xwe bikin. Em ê mîrateya çandî û dîrokî ya Amedê bigihînin zimanan.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMê de;

Em ê Gerîndehiyên Parastin û Pêşvebirina Ziman ên ku ji aliyê qeyûman ve hatine girtin ji nû ve vekin û tevahiya xizmetên xwe yê xwecihî bi awayekî pirzimanî bikin.

- Em ê dîsa navên pirzimanî li bajaran, taxan, gundan, kuçe û kolanan bikin.
- Em ê pano û tabelayên li qadên giştî bi awayekî pirzimanî çêbikin.
- Em ê bi projeya “Pêşiyê Gotin Hebû” berhemên devkî yê wêjeya gel bi awayekî pirzimanî berhev bikin û çap bikin.
- Em ê hejmara baxçeyên zarokan ên pirzimanî yê wek Zarokistan û Xalxalokê zêde bikin.
- Em ê bi şiyara “Zimanê Me Hebûna Me Ye” ziman û çandên xwecihî yê ku bi tunebûnê re rû bi rû ne biparêzin, vejînin û bi pêş bixin. Ji bo vê yekê em ê xebatên perwerdehiyê çêbikin, kûrzên ziman, xebatên ferengê, komxebat û forûman li dar bixin.
- Em ê şanoyên zarokan bi zimanê dayîkê ji nû ve bileyîzin û lîstikên pirzimanî pêşkêşî zarokên xwe bikin.

Em ê li Amedê xebatên ku Kurdî di tevahiya qadên jiyane de û li qadên giştî bê bikaranîn bidin destpêkirin. Ji bo ku zimanê dayîkê bi awayekî berbelav bê bikaranîn, em ê bi modeleke bi beşdarî stratejiyan bi pêş bixin.

Di Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê piştgiriya xebatkar û alav û amûran bidin baxçeyên zarokan ên ku bixwazin bernameya ku şaredariya me li baxçeyên zarokan ên bi Kurdî disepîne, bisepînin.
- Em ê ji bo ku bîra kolektîf veguhêzin nifşên nû, lîstikên zarokan û çîrokan berhev bikin Mala Çîrokbêjan damezirînin.
- Em ê ji bo zarokan li parkan çalakî û şahiyên bi Kurdî li dar bixin.
- Em ê platform, sazî û dezgehên ku xebatên bi Kurdî dikin teşwîq bikin, ji bo wan derfetan biafirînin.

DEM DEMA ZAROK AMEDÊ YE

Li hemberî polîtîkaya zarokan a hişmendiya navendparêz a ku bi bîr û baweriyê zayendparêz, saxlemîparêz, mîlîtarîst, dijberatîparêz dixwaze yekrengiyê pêk bîne; em bajarekî zarokan ê bi beşdarî, azad, wekhev, ewle ava dikin.

Ji bo Ameda bajarê zarokan, Di Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê Navenda Xebat û Mafên Zarokan damezirînin û xebatên zarokan bikin.



- Em ê bi beşdariya zarokên ji tevahiya navçeyan, Meclîsa Zarokan damezirînin.
- Em ê mîhrîcanên zarokan ên ku bibin kevneşopî li dar bixin.
- Em ê hinek beşên avahiyên wek pirtûkxane yê li bajêr bi tenê ji bo ku zarok bi kar bînin bisêwirînin.
- Em ê Gundê Xwezaparêzê Zarokan ava bikin.
- Em ê ji bo zarokên noropircure piştgiriya terapiya bi lîstik û ergoterapiyê bidin.
- Em ê bi kampanyaya parkên lîstikê yê ku her kes bikaribe xwe bigihînê, navçe, tax û gundên ku qada lîstikê lê tune be nehêlin.
- Em ê ji bo ku çand, cih û war û zimanên din bi zarokan bidin nasîn ger û geşên xwezayê, dîrokê û çandê li dar bixin.
- Em ê baxçeyên zarokan, kargeh, kûrs û malên çîrokbêjan ên ku bi zimanê dayîkê xizmetê didin zarokan vekin.
- Em ê wargehên werzîşê, birkên avjeniyê, kampên havînê û navendên perwerdehiyê yê ku hemû zarok bikaribin xwe bigihînê bi awayekî berbelav vebikin.

JI BO ASTENDARAN JIYANEKE NÛ PÊKAN E

Bi bîr û baweriya me ya rêveberiyên xwecihî ya ku tevahiya cudakariyên, êrîşên, norm û xweferzkirinên bîrdoziyên saxlemarêz ên li dijî astengdaran ji binî ve red dike, em ê jiyaneke nû ya ku ji bo astengdaran mafê jiyaneke serbixwe, wekhev û birûmet diparêze, ava bikin.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê ji bo veguherandina çanda asatendariyê ya neyînî ya ku dibe sedema pêşdarazî, jiberkirin û zanînên negatîf ên ku bi salan di bîra kolektîf a civakî de hatine bicihkirin, di rêveberiyên xwecihî de ji bo afirandina çandeke nû ya astendariyê veguherînekê bidin destpêkirin.
- Em ê bi sêwirînên gerdûnî, Amedeke ku tevahiya astengdaran bikaribin xwe bigihîninê ava bikin.
- Em ê ji bo destnîşankirina kêşe û pêdiviyên bajêr nexşeya astengdaran çêbikin. Bi vê nexşeyê, di çarçoveya pêdiviyên astengdaran de, em ê li cih û warên ku her kes bikaribe xwe bigihîninê, beşdariya astengdaran a çalak a jiyane pêk bînin.
- Em ê ji bo mafê jiyaneke azad û bi rûmet astengdaran bigirin kar.
- Em ê Serokatiya Daîreya Astengdaran damezirînin.
- Em ê wergêrên zimanê îşaretan bigirin kar.
- Em ê ji bo astengdarên noropircureyî sepana kartê gula berbero bikin meriyetê.
- Em ê di siwaryên veguhastina tomerî de anonsên bi deng û bi reng bikin.

PÎREBÎ BÛ, PORSPÎ BÛ, TAQÊ REŞ BÛ, RÛ GEVEZ

Ji bo hemwelatliyên me yê kal û pîr, Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê xizmetên alîkariyê yê ku jiyane hêsantir dikin pêşkêş bikin.
- Em ê qadên çalakiya civakî zêde bikin, li bajêr û li derveyê bajêr kamp, ger û geştan çêbikin.
- Em ê piştgiriya tadîlat û tamîratê ya qadên jiyane bidin.
- Em ê derfetan biafirînin ku hemwelatliyên me yê kal û pîr ji navendên



tenduristî, werzîş, çand û hunerê yê şaredariyên me bi awayekî bê pere sûdê wergirin.

- Em ê derfetan biafirînin ku hemwelatîyên me yê kal û pîr li gor şiyar û ezmûnên xwe bi dildarî beşdarî hilberîna bibin.

JI BO AMEDEKE CIWAN DEMAMED

Li hemberî têgihîştina desthilatdariyê ya navseretiyê û hişmendiya wê ya pasîfîzekirina ciwanan, azadîxwaziya ciwanan dê bê esasgirtin û ciwan dê di rêveberina bajêr de bibin xwedîgotin. Amedeke Ciwan bi polîtîkayên ku ciwan di pêvajoya rêveberiyên xwecihî de bi awayekî rasterast beşdarî pêvajoyên gotin, erk û biryarê dibin, pêkan e. Bîr û baweriya me ya rêveberiyên xwecihî ciwanan wek kiryar dipejirîne û vîna wan esas digire. Em tên ku em di cîhana ku diguhere de, raman, têgihîştin û daxwazên ciwanan bi AMEDA CIWAN pêk bînin.

Bi CIWAN Amedê, Di Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê de;

- Em ê ji bo bîr û baweriyeke rêveberiyên xwecihî ya ku ciwan bi xwerengî û dînamîzma xwe bikaribin di mekanîzmayên biryardanê de cih bigirin, Meclîsên Ciwanan ava bikin. Em ê bi Meclîsên Ciwanan re civînên periyodîk li dar bixin.

- Em ê Navendên Ciwanan ên ku pêdiviyên pîşeyî û sosyoçandî yên ciwanan bi cih bînin û ciwan bikaribin hunerwerî û behreyên xwe bi pêş bixin, damezirînin.
- Em ê ji bo ku di qada perwerdehiyê de piştgiriye bidin ciwanan, navendên amadekariyê, pirtûkxane û navendên zanistê damezirînin.
- Bicihanîna pêdiviyên ciwanan ên wek perwerdehî, tenduristî, xwarin, strîn, veguhastin, werzîş û pêşveçûnên civakî û çandî ya bê pere û baş divêtiyeke rêveberiyên xwecihî yên civakparêz e. Ji bo ku ciwan sûdê ji xizmetên bi vî awayî wergirin, em ê sepana erzan a CIWANKARTê bikin meriyetê.
- Em ê butçeya rêveberiyên xwecihî ya ji bo ciwanan çêbikin.
- Em ê ji bo têkoşîna li dijî bêkariya ciwanan, bi tevahiya karde û kiryarên vê pirsgirêkê re planên wergirtina kar a ciwanan ên demkurt û demdirêj amade bikin.
- Em ê polîtîkayên xweser ên ji bo wergirtina kar a jinên ciwan bi pêş bixin û bikin ku beşdarî pêvajoyên hilberîne bibin.
- Em ê ji bo wergirtina kar a mayînde û wesfdar, di gelek waran de kûrsên pîşeyî bidin.
- Em ê bi tevahiya dînamîkên li bajêr re derfetên bûrsan biafirînin.
- Em ê wargehên xwendekaran ên ewle û wesfdar ên ku pêdiviya xwendekaran a stirîne bi cih bînin vekin.
- Em ê li Zanîngeha Dîcleyê, serê sibehan, şorbeya belaş li ciwanan belav bikin.
- Em ê di serî de ji bo jinên ciwan, ji bo tevahiya xwendekarên zanîngehê yên ku pêdiviya wan pê hebe wargehên civakî, dibistanên werzîşê, xwaringehên belaş û cilşoxaneyên belaş ava bikin.
- Em ê ji bo koçberên ciwan, astengdarên ciwan, ciwanên ku hatine vederkirin mekanîzmayên ku xizmeta wekhev pêşkêş bike ava bikin.
- Em ê astengiyên li pêşiya xwegihandina zanyariyê ya ciwanan rakin. Wek mafekî bingehîn, em ê qadên xwegihandina zanyariyê berfireh bikin; înterneta bê sansur, bê pere û azad li navendên navçeyan, di siwaryên veguhastina tomerî de û li qadên bajêr ên giştî bikin xizmeta gelê xwe.
- Em ê ji bo ku bingeha hilberîna zanyariya zanistî li Amedê deynin, Navenda Zanist û Teknolojiyê ya Ciwanan damezirînin.
- Em ê kampên ku çalakiyên zanistî, civakî, çandî lê bînin kirin ji bo ciwanên kêmdarfet di demên betlaneyan de sûdê jê wergirin, birêxistin bikin.

BAJARÊ LI DIJÎ MADEYÊN HIŞBIR, AMED

Yek ji qadên sereke yên ku di berpirsiyariya rêveberiyên me yên xwecihê de ye, pirsgrêka madeyên hişbir e. Em ê rastiya di piştperdeya bikaranîna madeyên hişbir de bibînin û li dijî bikaranîna madeyên hişbir têbikoşin.

DI RÊVEBERIYÊN ME YÊN XWECIHÊ YÊN AMEDÊ YÊN PARTIYA DEMÊ DE;

- Em ê rêveberiyêke bi beşdarî ya ku di dema lêgerîn û dîtina çareseriyên de bi tevahiya aliyên re tevdigere esas bigirin.
- Em ê bi awayekî giştî nêzî mijara tiryakêşî û madeyên hişbir bibin.
- m ê pêşengiyê bidin dîtina çareseriyên ji bo qadên ku bikaranîna madeyên hişbir lê zêde ye.
- Em ê kampanyayên ku bi bîr û baweriyê seferberiyêke giştî afirandina hişmendiyê “bajarê li dijî madeyên hişbir” ji xwe re dikin armanc çêbikin.
- Em ê cih û warên metrûk ên ku veguherîne cihê bikaranîna madeyên hişbir bi veguherînên xwezayî sererast bikin.

HER DEM WERZÎŞ HER DEM AMED

Bajarên modern, çî biçûk, çî mezin berê tevahiya endamên civakê didin jiyaneke bê liv û tevger. Xeyaleke me heye ku em Amedê bikin bajarekî dînamîk ê wisa ku civak bi awayekî giştî tevbigerê, werzîşa komî veguhere çandekê. Em tînin ku em xeyala xwe ya Ameda Dînamîk pêk bînin. Wek rêveberiyên xwecihê, berovajiyê hişmendiyê werzîşa endustriyel, em werzîşê wek hêmaneke aştî û hevgeriyê dibînin.

Bi Ameda Dînamîk, Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yê Partiya DEMÊ de;

- Em ê her sal, di meha Adarê de, Beza Gel a Newrozê ya Gelêrî çêbikin.
- Em ê werzîşên xwe yê gelêrî bi çalakî û mîhrîcanên cuda vejînin.
- Em ê hejmara eywanên werzîşê yê sergirtî, birkên avjeniyê û qadên lîstikê yê li taxan ên ku gel bi awayekî belaş bikaribe bi kar bîne, zêde bikin.
- Em ê di serî de li parkan, li tevahiya cihên guncaw alav û amûrên werzîşê bi cih bikin û rêyên meşê zêde bikin.



- Em ê di beşên wek goga lîngan, goga zembîlê û goga destan de Tûrnûvayên Kuçeyan ên Amedê li dar bixin.
- Em ê li birkên avjeniyê yê sergirtî, di hemû demsalan de, bi armanca perwerdekirinê kûrsên avjeniyê û dibistana noqdariyê vekin, perwerdehiyên lêgerîn û rizgarkirinê bidin.
- Em ê wek Şaredariya Bajarê Mezin, bi hevkarîya bi şaredariyên navçeyan re, dibistanên werzîşê vekin.
- Em ê wargehên werzîşê yê ji bo goga lîngan, goga zembîlê, goga destan guncaw, ên ku tê de alav û amûrên werzîşa li derve hebin û qadên çalakiyên werzîşê hebin, vekin.
- Em ê li navenda bajêr û bajarokan kûrsên amadekariya ji bo ezmûnên akademyên werzîşê vekin.

JI BO AMEDEKE KU KOÇBER Û PENABER BIKARIBIN LÊ BIJÎN!

Rêveberiyên Me Yê Xwecihê Yê Amedê yê Partiya DEMê bi rêgeza “teva-hiya cîhanê ya her kesî ye”, mafê jiyîna jiyaneke bi rûmet a koçber û penaberan û statuya wan a hiqûqî diparêzin; nijadperestî û cudakariyê red dikin; ji bo bicihanîna pêdiviyên jiyani yê wek stirîn, xwarin, tenduristî, perwerdehî û wergirtina kar a koçber û penaberan xwe berpirsiyar dibînin.

- Em ê li Amedê polîtîkayeke civakî ya ku pêkvejiyaneke wekhev û azad a bi koçber û penanberan re ji xwe re dike armanc, bisepînin.
- Em ê derfetan biafirînin ku koçber û penaber xizmetên xwecihî bi zimanê xwe yê dayîkê bigirin.
- Em ê ji bo ku kampên penaberan ji xwegihandina civakê, hevgirî û venêrîne re vebin bixebitin, rêveberiyên xwecihî jî bikin parçeyekî vê hevgeriyê.
- Em ê Peymana Stenbolê ya ku rê li tundiya li hemberî jinên koçber û penaber digire bipejirînin û bisepînin.
- Em ê li navendên jinan, ji bo ku jinên koçber û penaber jiyaneke azad, wekhev û birûmet ava bikin, bi tevahiya muxatabên vê mijarê re xebatên destnîşankirina polîtîkayan bikin.

BAJARÊ GELAN Û BAWERIYAN AMED

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yên Partiya DEMê de;

Amed bajarekî qedîm e û mazûvaniya gelek şaristaniyan kiriye. Em ê ji bo ku tevahiya gel û baweriyên bi awayekî azad bijîn di xizmetan de wekhevîyê esas bigirin; em ê di navbera baweriyên û gelan de bi tu awayî cudakariyê nekin. Li gor pêdiviyên perestgehên tevahiya baweriyên, em ê xizmetên şaredariyê bi awayekî bê pere bikin. Perestgehên wek Surp Giragos, Dayîka Meyrem, Mor Petyûn û Mizgefta Mezin hîmên bingehîn ên nasnameya dîrokî ya Amedê ne. Em ê van avahiyan biparêzin û piştgiriya bidin restorasyona yên ku hilweşiyane. Li Ameda ku cudahî dewlemendî ne; bêyî ku em cudakariya olî, mezhebî, felsefî û siyasî bikin, em ê nasnameya bajêr a ku tevahiya gelan û baweriyên bi awayekî azad bijîn, xurt bikin.

PLANA STRATEJIYA TENDURISTIYÊ YA AMEDÊ YA PARTIYA DEMÊ

Partiya DEMê; Mafê Tenduristiyê wek mafekî bingehîn ê mirovî dibîne. Nijad, ol, baweriyên polîtîk, rewşa aborî û civakî ya wan çî dibe bila bibe, ji bo ku tevahiya hemwelatîyan ji xizmetên şaredariyê yên tenduristiyê yên ku xwegihandina wan hêsan e, bê pere ye, bi awayekî wekhev û bi zimanê dayîkê tî pêşkêşkirin û sûdê wergerin hewl dide.

Di Rêveberiyên Me Yên Xwecihê Yên Amedê yên Partiya DEMê de;

- Em ê bi hişmendiya ku xizmetiyên tenduristiya gel ên giştî, yên bergir û parastinê wek yek ji xizmetên ji bo raya giştî yên rêveberiyên xwecihê dipejirîne; ji bo ku tevahiya hemwelatîyan bê pere, bi awayekî wekhev, bi zimanê dayîkê û bi hêsanî bikaribin xwe bigihînin xizmetên tenduristiyê; bi tevahiya sazî û dezgehên tenduristiyê yê têkildar, ode, rêxistinên civaka sîvîl û sendîkayan re Plana Stratejiya Tenduristiyê ya Amedê ya Rêveberiyên Me Yên Xwecihê yên Amedê ya Partiya DEMê amade bikin.
- Em ê di plansaziya bajêr de, ji bo her taxê, cih bidin yekeyên ku xizmetên tenduristiyê yên gavê yekem didin (yekeyên tenduristiya malbatê, navendên tenduristiya malbatê û hwd.)
- Em ê bi armanca xizmetên tenduristiyê yên bergirî û parastinê “Yekeyên Tenduristiya Gel û Navendên Tenduristiya Gel” damezirînin. Li van navendan, di serî de destnîşankirina pêşwext a pençeşêrê, em ê ji bo gelek nexweşînan vekolînan bikin.
- Em ê bi sazî û dezgehên tenduristiyê, ode, rêxistinên civaka sîvîl û sendîkayan re xebatên hevpar bikin.
- Em ê bi Tîmên Tenduristiyê yên Gerok li taxan û gundan xebatên tenduristiyê geş bikin, venêrînen ava vexwarinê berbelav bikin û perwerdehiyên der barê tenduristî û paqijiyê de bi zimanê dayîkê bidin.
- Em ê di serî de ji bo nexweşên ku bi pençeşêrê ketine, di pêvajoyên ku pergala xweparastinê lawaz dibe de, ji bo nexweşên ku siwareyên veguhastina tomerî ji bo wan xetere ne, ji bo ku bi hêsanî bikaribin xwe bigihînin navendên tenduristiyê yan jî nexweşxaneyan, xizmeta veguhastina bê pere ya bi siwareyên taybet bidin.
- m ê li tevahiya dibistanan û gundan venêrîna tenduristiya dev û diranan a gerok û bê pere berbelav bikin û bi awayekî bê pere xizmeta başkirinê bidin kesên ku pêdiviya wan heye.
- Em ê vekirina navendên tenduristiyê yên ji bo dayîk û zarokan ên ku jin bi hêsanî bikaribin xwe bigihîninê û bê pere mûeyne bidin, derman, parza, bêzên zarokan û xwarina pitikan lê peyde bikin bidomînin.
- Em ê tevahiya xizmetên tenduristiyê bi hişmendiya ku astengdar bi awayekî wekhev bikaribin jê sûdê wergirtin, pêşkêş bikin.

- Em ê derfetan biafirînin ku koçber û penaber bi zimanê xwe yê dayîkê xwe bigihînin xizmetên tenduristiyê.
- Em ê ji bo kêmkirina berxwuriya xurekên ku bi genetîka wan hatiye leysîtin, bi meclîsên tenduristiyê, sazî û dezgehên têkildar û çapemeniyê re kampanyayên hevparli dar bixin. Em ê kesên ku xurekên netendurist belav dikin û difiroşin ceza bikin.
- Em ê têkoşîna bi bandor û xwezaparêz a li dijî faktorên ku dê bandorê li tenduristiya mirovan bikin, bê navber bidomînin.
- Em ê ji bo hemwelatîyên me yên ku li derveyî navendên bajar û navçeyan dijîn û ji bo tedawiyê tînin nexweşxaneyên li van deran, li gor pêdivîyan, mêvanxane û xwaringehan damezirînin.

AMED YEREL YÖNETİMLER KADIN BEYANNAMESİ 2024



HER DEM JIN
HER DEM AMED

HER DEM JIN HER DEM AMED

1978'de Hilvan'da üç kadın meclis üyesi ile başlattığımız yerel yönetimlerde kadın mücadelemizi 2014 yılında Eş Başkanlık ile yeni bir aşamaya taşıdık. Kadınlar olarak yerel yönetimleri mücadele tarihimizden aldığımız politik mirasla güçlendirdik, örgütledik. Toplumsal bakış açısında ve zihinlerde dönüşümler yarattık. Yerel yönetimlerde cinsiyetçi, tekçi ve rantçı politikalara karşı demokratik ve kadın özgürlükçü bir yerel yönetimlerin inşası için geçmişten bugüne mücadelemizi kararlılıkla sürdürdük, kadınlar olarak örgütlü gücümüz ile belediyelerimizi Eş Başkanlık ve Eşit Temsiliyet ile yönetmeye aday olduk. Yetkiyi tek elde toplayan aşırı merkezileşmiş, erkeklerin "doğal" alanları olarak kodlanan yerel yönetimlerde eşit temsiliyeti sağlama mücadelemiz ile hem siyaseti demokratikleştirdik hem de demokratik siyasetin toplumun temel taşlarından biri olduğunu açığa çıkardık.

Bu inançla ve kararlılıkla YENİDEN yerel yönetimlerde "KADIN İRADESİYLE YEREL DEMOKRASİYE" DİYORUZ!



HER DEM JIN
HER DEM AMED

